

Deynkirin e an Xerakirin e

erebî nizanin, lê bi tundî bi gotinên wana girtine û xwe pê razî jî dikin ! û ji bo vê yekê ez ne bi nijadperistî dibêjim, lê ji mafê me ye ku zimanê me kurdî be, nemaze gelek zarav li cem me hene û mirov dikare ji wana zimanekî bedew û xurî kurdî tekûz bike, an jî gotinên nûjen ji layê zimanzanan ve bêne afirandin ku li gor demê û zimanê kurdî biguncin.

Di vê gotarê de ezê tenê li ser du babetan rawestim, yek di **Govara Gulîstan** jimara yekem de hatibû weşandin û ya din jî di enternet de hatibû weşandin, helbet bê ku ez nêzî naverok û ramana herdu babetan bibim. Di lêkolîna

Mamuste Mûrad Ciwan de a ku bi navê (çend pirsên rêzimana kurdî) di govara gulîstanê jimara yekem de hatiye weşandin.

Rastî ez matmayî mam çimkî mamuste bi zimanê zimanzan gotara xwe nivîsandiye û doza rastnivîs û rastaxaftinê kirbû, ji xwe di pêşî de zelal kirina ziman û deyn kirina gotinên jî kiribû, cî ji zaravên kurdî û çî ji zimanên din. Vê yeka ku hişt ez matmayî bimînim; ma gelo ne divabû di pêşî de ew li gor daxwaz û şîretên xwe here û bi cîwar bike! An şîretên wî ji xwendevanan re ne, ne jê re ne ! **keko Xwedê hişt** ma ê doza paqîşkirina ziman bixwaze, hewqas gotinên biyanî tevli lêkolîna xwe dike! Ji xwe ez têkiliyê bi naveroka babetê nakim, lê tenê dixwazim ji xwendevanan re bêjim ku min çar rûpel ji babeta **Mamuste Mûrad** ve xwend û min dît ku sêst û du gotinên erebî tê de cî girtine û hin ji wan gotinan sê, çar caran jî dubare kiriyê! ji xwe ewîna gotiye ku gava gotin tune be mirov dikare ji zimanên din eeyn bike, lê çêra hebûna gotinan û nezaniya bi hebûna wana nekiriye ! Helbet dizanim ku **Mamuste Murad** bi erebî nizane, lewma jê weye ku hema gotin ne tirkî be ji xwe kurdî ye, lê mixabin heta di vê yekê de jî hin gotinên tirkî deyn kiriyê ! diyar e ku ev kêşe jê re ne giring e, ji ber wisa xwe ne westandiye ku zimanê lêkolîna xwe xirû bi kurdî binivîsîne tev ku di mijara rêziman de ye. Û ji bo ev kêşe diyar bibe ezê di xiştêkî de piraniya van gotinan binivîsim weke **Mamuste** ew bi kar anîne û li hember jî kurdîya wana çî ye ! ji xwe hin ji wan gotinên bi karanîna wana di zimanê kurdî de bê wate ye û bi karanîna wana di zimanê erebî de gelek wateyên cihêwaz didin, lewma ezê nizani bim kîjan wateyê ji Mamuste Murad re binivîsim!!.

N	Gotinên Erebi	Kurdiya wana
1	Îmkan	Şiyan (tewanayî)
2	Wasîte – edat	Bijêvanî – amraz
3	Ders	Xwendin
4	Dersxane	Dibistan
5	Huqûqî	Mafnasî
6	Muhtac	Niyaz – pêdivî
7	Xususî	Taybet
8	Mesele	Kêşe
9	Kemilandin	Tekûz
10	Meziyet	Ciyakar
11	Sexsî	Ferezî
12	Kitêb	Pirtûk
13	Şahid	Bîner – dêdevan
14	Cumele	Hevok
15	Teb,a	Xurist
16	Qebûl	Pejirandin
17	Baqil	Bihîş
18	Îdare	Kargêrî
19	Mecbûr	Bê çare
20	Xelq	Xelk
N	Gotinên Erebi	Kurdiya wana
21	Muhawe	Pirohbe – pîkol
22	Red	Veger – bersiv
23	Derece	Rade – paye
24	Muhîm	Giring

25	Tehdît	Sînor
26	Qenaet	Bawerî
27	Tesbît	Çesipandin
28	Lehce	Zarav
29	Resmî	Fermî
30	Qaîde	Bingeh – binyat – binkok – rêzik
31	Tarîf	Danasîn
32	Munaqes	Gengeşe
33	Texrîb	Xerakirin
34	Basît	Sade – sana
35	Ma,ne	Wate
36	Fîil	Lêker
37	Îsrar	Rekgirtin
38	Eslî	Kevnewer
39	Bil,ekis	Berevajî
40	Fikir	Raman

Helbêt ev hin nimûne ne ji gotinên erebî yên di lêkolîna **Mamuste Murad** de hatine bi kar anîn. Û eger ne li ser ziman û rêziman bana, dîsa çare jê re hebû lê ka wê çare çî be gava zimanzan wisa be! Ji xwe ez ji we venaşêrim gava gotinên çewt hewqas bin di lêkolîneke rêzimanî de, ma êdî wê rasteqîniya xwe çawa di mejiyê merovê Kurd de bigire!.

Gotara duyem jî ya **Nivîskar Adar Jiyan a ku bi navê Ziman û Raman**. Hin gotin **Mamuste Adar** bi karanîne ew jî gotinên Erebi ne minak: **Rik, dinisilin, difikire,û htd.** Ku li hember wana jî gotinên Kurdî hene, ji ber wisa Mirov li ser radiweste û hêvî dike ku nivîskar heta karî be divêt gotinên wîna Kurdî bin, çimkî ev gotin bela dibin û hêdî hêdî cî digirin, lewma xwestek ew e ku em nivîsên xwe zelal bikin bi zanebûn gotinên Kurdî sererast û tekûz bikin, ji ber gava carekê gotinek ji nezanî bi kar tê, divê ew careke din dubare nebe û dubarekirina şaşiyê kêr, zêde girêdaye bi radeya bîrweriya Mirov û hestên wî yên netewî ! ji ber kêşe ne kesîti û ferezî ye, lê merovanetî û şarezebûn e, wêneya gel di zimanê wî de ye û bîrweriya nivîskar di gotinên serê Pênûsa wî de ne.

*Nivîskar û Rexnevanekî Kurd e ji Sûrya, yek ji damezrînerê navenda Celadet Bedirxan a rewşenbîrî li Qamişlo ye .

Günter Gras.....û Otto Pankok xwend.

1951- 1952 cû italya û ferensa.
1953 - 1956 mala xwe guhest Berlîn.
1954 bi dilangera Balê a Swêsrî Anna Schwarz re şû kir.
1962 xelata Toreyî ya Ferensî „ Le meilleur liver etranger „ li ser Pirtûka xwe „ Die Blechtrommel „ Dahola tenekeyî wergirt.
1979 pirtûka wîna “ Die Blechtrommel“ sînarist **volker Schlöndorff** bi alîkariya Günter Sînaryo jê re cêkir vî Filimî xelata baştirîn filimê Elmanî „ Die Goldene Schale „ wergirt xelata mehrecana Die Goldene palme „ wergirt û sala **1980** Oskar ji mehed Award wergirt wekî baştirîn filim bi zimanê biyanî.
1993 Dektora fexrî ji Zanîngeha Gdansk / Danzig (Polen) wergirt.
1994 xelata Toreyî ya wilayete Bayern ji mehed el finûn el cemîle (kolêca hunerên bedew) werdigre
1996 xelata Thomas - Mann ya bajarê Lübeck (bakurê Elmanya)werdigre
1999 xelata Prinz – von Asturien û xelata Nobel ya el edeb ji Kolêca zanistê a Swêdî wedigre
12.4.2002 nameyekê ji Serokê hukumete Turkî re **Bülent Ecevit** dihinêre gelek kesên bi nav û deng siyasetmedar,nivîskar û.. uhd ev neme emze kirin, van kesan dixwestin ku Tirkî derfetê bide Kurdan ku fêrî zimanê xwe bibin, Dibistanên zimanê Kurdî werin vekirin û beşekî kurdologî li zanîngehên Turkî vekin, gelek Xortên kurd ew name imze kiribûn ku ew dixwazin beşê Kurdologî di zanîngehê de bixwînin eger derfetê bidin wana, lê mixabin gelek ji wana hatin girtin Günter Gras û nivîskarê Kurd **Yaşar Kemal** hevalê hevîn.

* Xwendevanekî Kolîja Zimanzaniyê li Göttingen e

HEYV RENGÊ AZADÎ YE

Xebat*

Bi pirsim,
 Bê bersivim
 Heyvê.....
 Çardeh şevên te çûn
 Tu,
 Na peyvê.....?

Vaye şeva pazdehan
 Tanî sibê,
 Li bende te
 Hişiyar mam
 Çi bikim
 Tu,na.....!!!!!!!

Ger tu zanibe
 Hebûna me bi hev e !!!!
 Roniya te ji rojê
 Lê roniya min ji te
 Bêyî rojê tu ronî nadê,
 Û ne ez bêyî te

Roniya te
 Digihe zîndanên tarî
 Zîndanên Amed û Celil
 Zîndanên Mihabad û Erbil
 Li Qudsê li Efrîn
 Li Libnan
 Li Filestîn
 Belaya ev roniya jîn

Dixwazim!
 Tu xatir nexwazî
 Tim
 Û
 Tim

Li esman bî
 Bi ronî û geş bî.
 Roniya te
 Digihe Mosko,Çin û Berlîn
 Digihe Emerîka latîn
 Xuya ye li Kûba rengîn
 Doza te
 Pir giran e
 Ez jî dixwazim weke te
 A Ş Î T Î
 Naxwazim xwîn.
 Heyva min xuya be
 Bi ronî û geş be
 Neçe

.....ava.....!!!!!!
 bi wî kirasê sipî û bûkanî
 ku pê xuyayî hertim
 tim.....
 dixwezî
 serbestî,wekhevî,azadî.
 Silav.....
 Silav li te
 Dixwazim tu neçî ava
 Piştî şeva dawî
 Xuya be,yekşevî
 Bi rengê azadî,wekhevî
 Tim.....
 Xuya be geş
 Hêviya min û te
 Ev jiyana sitem û zor
 Bibe xweş.
 Silav.....
 Dixwazim,
 Xatir nexwazî
 Tim xuya bî

 silav li te HEYVÊ

* Helbestvanekî Kurdistana rojava ye, (Tibesipiyê), sala 1990 Şehîd ketiye